

## Rêjîma dagirkar bi darê zorê dengê Pexşan Ezîzî tomar kiriye

Piştî ku dengê Pexşan Ezîzî girtiya siyasî ya Kurd ji nav girtîgehê derket ku tê de daxwaza alîkariya Xezê dike, niha derdikeve holê ku gotinên wê di bin givaşê de bûne.Çalakvan dibêjin Pexşan di destpêka gotinên xwe de gotiye mixabin ez bi darvekirinê hatime sizakirin. Ev jî xuya dike ku ew bi zorê hatiye neçarkirin ku biaxive.

Dom»R:7







## Konferansa Köln ê derfeteke nû ji bo tevgera rizgariya Rojhelata Kurdistanê

Konferansa 28ê Îlona 2025an, ku bi beşdariya heft partiyên siyasî yên li Rojhilatê Kurdistanê û çend kesayetên akademîk û serbixwe hate lidarxistin, gaveke nû û pêwîst e li ser rêya yekîtî û ji nû ve pênasekirina tevgera neteweyî ya Kurd. Ev civîn di rewşekê de pêk hat ku erdnîgariya siyasî ya herêmê piştî pêşketinên berfireh ên navxweyî û herêmî guhertinên bingehîn derbas kirive.

Dom» R:3

*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (503)07-10-2025 Buha (1000) Tûmen*



## Kurd deyndarê Îsmail Beşikçi ne!

Ev bû çend hefte ku li ser navê ”kurdperwerîyê”, ”welatperwerîyê”, ”sîyasetmedarîyê”, ”nivîskarîyê”, ”rewşenbîrîyê” û wd. êrîş, tehdît û heqaret li sosyologê tirk Îsmalil Beşikçi dibarînin. Li vir ez behsa êrîş, tehdît û heqaretan dikim, ne ku behsa rexneyan.Eger di çarçoweya rexneyan da li Beşikçi rexne bihata xistin, bêguman ew di çarçoweyeka dî da dê bihata nirxandin. Beşikçi kîye û çi kirîye ku hew qas êrîş tên ser wî?

Dom» R:10

## Dengê Azadiyê tê




Bi sedan sal e ku netewên di ser erdnîgariya bi navê Îranê yên xeyrî Fars, wek Kurd, Belûç, Ereb, Azerî, Tirkemen, û ….. bi hemî avayekê têne asmîlekirin û di bin zilm û zordariya desthilata navendî de ji mafên herî destpêkiye xwe hatine bêparkirin.

Gelek ji wan netewan parek ji nasnameya xwe jî ji dest dane û heliyane û hesta netewiya wan gelek kêmreng bûye.

Nihajî ji bilî netewa serdest anku Fars, mixabin kes û girûpên wisa di nava netewên bê maf de hene ku ne tenê çi meylek bo derkeftina li jêrdestiyê û bidestxistina mafên neteweyî ye xwe çinînin, belku ev jî gelek caran înkara nasnameya xwe dikin û keftine jêr bandora diruşmên “Yêk milet, Yêk weten û yêk Ferheng û yêk Ziman” a desthilana dagîrkere navendî.

Niha ku rewşa deverê û bi taybetî rewşa ku rêjîma Îranê tê de ye, dide xuyakirin ku di heyamê çend mehên pêşya me de dê guhertin û bûyerên bingehîn çêbibin, lewra hekî em Kurd û hemî netewên bê mafe Îranê bi hişyarî û hişmendiyeke hûr tevnegerin û xwe bo qewmîna wan bûyeran amade nekin, bê guma em dê rastî metirsiyên gelek mezin bên û dê tevlîheviyek çêbe ku renge wê demê êdî zû bi kesê neyête çareserkirin.

Bo wê yekê ezê amaje bi 2 xalên girîng bikim ku weke hewcehiya herî girîng pêşya netewên îranê ne.

**1 –** Hevxebatî û hevdengiya digel neteweyên bê maf û kombûna li devra armanc û stratêjiyekî hevpar ji boy çêkirina Îrana piştî nemana rêjîma dîktator a îslamiya wilayeta feqîh, ku her niha de divê lihevkirine di navbera wan netewane de çêbibe ku aliyê kêm li ser hin xalên bingehîne weke dêmokrasî, hilbijartina azad, rêfrandom bo diyarîkirina sîstema birêveberiya welat, wekheviya di navbera jin û mêran, sekolar û piloralîzm û ……

ger îro ev neyê kirin, bê şik û guman dê piştî nemana wê rêjîmê, lihevkirin gelek îza be û egera ji destçona derfetê heye û renge taqimekî navendgera ji vê bêbernameyî ya netewan, bikar bîne bo ji nû ve sepandina sîstimekî dîktator û navendgera.

**2 –** Yêkitî û hevxebatî û yêkgotariya di navbera hêz û aliyên siyasî ên xwedî bandore Rojhilatê Kurdistanê, ger nihade çênebe û enî yan navendekî alîkarî neyê avakirin û hêz û aliyên siyasî li bin çetrekê de kom neke, ger ev partiyên siyasî heçî kîjan bi cuda tevbigere û nekare libekê ji îdolojî û otorîteya siyasî û hizbiya xwe bête xwarê, û her aliyek cuda û gorî siyaseta xwe tevbigere, bêguman hem dê roja qewmînê û guhertinê de lihevkirin zehmet be, hem gelê me bê hivî dibe, û hem jî egera çêbûna netebayî û pevçon û aloziyan jî heye, ev jî dê wekî gelek ceribandin û dersên berê li dîroka xebata rizgarîxwaziya me de, bi xala nerênî û xirab bête tomar kirin û egera ji destçona heçî derfetekê jî heye û dîsan û li vê qonaxa guherinê de jî serê me bê kum bimîne.

Bo herduk xalan jî direnge û derfet bila jidest neçin.



## Hişikbûna Gola Urmiyê: Trajediyeke siyasî-ekolojîk

Dom » R:4



## Nezelaliya Helwêsta Amerîka li hember mafên Gelê Kurd li Sûriyê

Dom » R:8

# Dîtingeha Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li derheq vegerana dorpêçên navnetewî bo ser Îranê




Piştî derbasbûna 10 salan, cara dawî biryarnameya navkî li navbera Îran û welatên naskirî bi 5+1 bi dawî hat. Lihevkirina Bercamê ku biryara 2231 a Şêwreya Ewlehî ya Netewên Yekgirtî li pey hat û dorpêçên aborî yên navnetewî yên taybet bi bernameya navkî ya Îranê ragirtin, bi pêngawek girîng a civaka navnetewî li pêxema parastina ewlehî û aramiya navnetewî hate hesibandin, hevdem danîna mikanîsma maşê li vê lihevkirinê de ji çendîn waran ve girîng û balkêş bû.

Şêwreya Ewlehî li biryara 2231 de bo yekem car, rêkarek li jêr navê mikanîzma maşê bo lihevkirineke navnetewî de danîn ku bi armanca alxahînbûn li cîbicîkirina biryarnameyê û pêbemdbûna komara îslamiya Îranê wek tawanbarê binpêkirina lihevkirina rêgirîker li geşedan bi çekên navkî li ber çav girtibû.

Cihê şik û gumanbûn û bawerîpênekirina civaka navnetewî bi komara îslamî ku berhema nêzîk bi nîv sedsala vê xoserî û neberpirsyaretî û çêkirina qeyranan e, gelên Îranê tûşî rewşeke nexwastî û metirsîdar kiriye. Geşedan bi projeyên navkî û mûşekî li derveyî standardên navnetewî û meyandina Oraniyomê bi tîratiya nêzî bikaranîna vê bo çeka navkî, rêjîma Îranê kiriye deshilatek zordar ku bi ser ewlehiya navnetwî gefek micid bê hisêb.

Ev xoseriya zêdexwazane bo binpêkirina sîstematîk a mafên mirov û berfirehtirbûna zêdetir a roj bi roj ya cudatiya li navbera xelk û deshilatê, destê civaka navnetewî bo liberxwegirtina her cure rêkarek bo rêgirîkirin li komara îslamî û sekinandina vê rêjîmê vekiriye.

Komara îslamiya îranê li heyama nêzî 5 dehik deshilatariya xwe de li pey bernameya navkî û destêwerdanên deverî ve tûşî pirsgirêk û lihembersekinîna civaka navnetewî bûye. Lê bi çalakkirina mikanîzma maşê ji aliyê Şêwreya Ewlehî û vegerîna siza û dorpêçên ragirtî, Îran dikeve rewşeke tevav dûrxistî û li warê siyasî û aborî ve bi tevavî bi tenê dimîne.

Zivirîna Îranê bo jêrfesla 7ê a daxuyaniya Netewên Yekgirtî wek encama çalakkirina dorpêçan, rewtiya liberxwegirtina her cure rêkarekê dide civaka navnetewî ku bikare metirsiya li ser ewlehî û aramiya navnetewî ji nav bibe.

Cîbîcîbûna dorpêçên aborî yên Şêwreya Ewlehî bo ser Îranê paşhatên cur bi cur dê hebin, wek rêgirîkirin li hinardekirina neftê wek şademara abûriya Îranê, despêrenegihîştin bi sîstema malî ya SWIFT bo veguhastina diraf, revîn û ji îranê derketina berhemhênerên biyanî, bilindbûna enflasiyonê, daketina berdewam a nirxa Tûmen û lezgîntirbûna pêvajoya paşveçona berhemhênerên navxweyî û biyanî li bazara berhemanîna Îranê ku karlêkeriya rasterast li ser jiyan û derbaskirina jiyana xelkê Îranê dibe û egera dunbarebûna serîhildanên nerizayetî û teqîna bêzarî û bê çaremana xelkê bi şêwazeke cuda tê çavrêkirin.

Tevî ku komara îslamî pêştir bo heyama 9 sal anku ji sala 1385 heta 1394 a Rojî li jêr fesla 7ê a Netewên Yekgirtî de bûye ku bi wajokirina lihevkirina Bercamê, dawî bi vê rewşê hatibû, lê piştî derbasbûna 10 salan û li rewşeke cuda çi li navxwe û çi derve, vegerîna rêjîmê bo jêrfesla 7ê, cuda ye û encamên vê dê gelek zêdetir ji berê giran û karesatbartir bin, bi curekê ku gelek zehmet e ku bikare berxwe bide an aliyê kêm bê nirx danek giran, jê rizgar bibe.

Niha komara îslamî li navxwe de tûşî çendîn qeyranên berfireh ên deshilatariyê bûye û tevî jidestdana bawerêpêkirina li cem netewên Îranê, nikare xizmetguzariyên destpêkî yên destpêkî dabîn bike. Serî hildana tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê ku li heyma çend heyvan de rêjîmê heta ser kendalê herîfandinê bir, ev rastiya da selimandin ku rêjîma siyasiya komara îslamî çi ji warê îdeolojî û çi li warê deshilatariyê ve şikest xwariye.

Ji aliyekî din ve û piştî bûyerên 7ê Octoberê û êrîşkirina îsraîl bo ser girûpên terorîstî yên ser bi rêjîma Îranê li deverê û piştre êrîşkirina Îsraîl û Amerîka bo ser Îranê û hevdem digel vegerîna dorpêçên Şêwreya ewlehî, rewşa deverê û navnetewî ya niha ya komara îslamî li bêhêztirîn dewrana xwe de ye û piraniya kartên siyasiyên li derve ji destê vê derketine.

Bi balkêşandin bi vê yekê ku ragiahndina dorpêçên aborî nabine sedema serîçemandina vê û dizanin jî ku rêjîmê ne pêbendî rêçareyên navnetewî ye û ne dest ji bernameya xwe ya navkî ber dide, civaka navnetewî dikare bi piştrastkirin bi madeya 42 a carnameya Netewên Yekgirtî bi armanca serîçemandina rêjîmê bo rêzgirtin li aşitî û ewlehî û aramiya navnetewî li dijî komara îslamê, hêzê bi kar bîne.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ku her ji destpêkê ve binyat û naveroka xosrane û dijemiroviya vê rêjîmê nas kiriye û bi berdewamî hewl daye ku rûkê rast ê komara îslamî bi Rojava bide nîşandan, li ser vê baweriyê ye ku rewşa niha ya Îranê û metirsiya destpêkirina şer li dijî komara îslamî, encama rasterast a siyasetên zêdexwaziyên rêjîmê û deshilatdarên rêjîmê berpirsyarê wan hemû rewşan li stuyê wan e.

hevdem welatên Rojavayî jî 10an sal e bi çavpoşîkirin li binpêkariyên rêjîma îranê li hember mafên mirovî û tepeserkirina sîstematîk a gelên Îranê û terorkirin û bidarvekirina kesên cudahizirên siyasî li navxwe û derveyî Îranê, alîkarîdana bi kirayar a rêjîmê bo berfirehtirkirina siyasetên têkderane û fitnesazên xwe daye.

Lewma bi kêmnîşandana fitneyên rêjîmê bi beranmeya navkî û berçavnegirtina naverok û binyata terorîstî û dije miroviyên vê rêjîmê derfeta pêşvebirinê bi siyasetên rêjîmê da. Gelên Îranê li serhildanên li salên derbasbûyî bi taybet li tevgera Jîna yê anku “Jin Jiyan azadî”yê de xwesta herifandina rêjîmê hebûn, û li durûşm û çalakiyên curbicur û cuda de ev xwest û daxwaziya xwe didane nîşandan.

Lewma civaka navnetewî hewceye ku vê rastiya rêjîmê bibîne û îtiraf bi vê yekê bike ku kite rêya rizgariya netewî û pêkhateyên Îranê li jêr sitem û dîktatoriyê û dawîanîn bi siyasetên neberpirsane û alozkerê aramiyê li dever û cîhanê de jî, nemana vê rêjîmê û hatina serkar a sîstemek dêmokratîk û berpirsyar e ku rêz li mafên mirovî û pêbendiyên navnetewî bigre.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê piştrast bi hêza xebatgêriya herdem rû bi geşekirina zêdetir a gelên Îranê û mifahvergirtin ji fakterên navnetewî, Opozîsiyona Komara Îslamî bo hevxebatî û komîserhevkirina hêzan bo herifandina komara îslamî û anîneserakrara sîstemeke siyasî ya Federal, Skolar û Dêmokrat, banghêj dike.

# Konferansa Köln ê derfeteke nû ji bo tevgera rizgariya Rojhelata Kurdistanê



N. Dr. Mecîd Heqî




Konferansa 28ê Îlona 2025an, ku bi beşdariya heft partiyên siyasî yên li Rojhilatê Kurdistanê û çend kesayetên akademîk û serbixwe hate lidarxistin, gaveke nû û pêwîst e li ser rêya yekîtî û ji nû ve pênasekirina tevgera neteweyî ya Kurd. Ev civîn di rewşekê de pêk hat ku erdnîgariya siyasî ya herêmê piştî pêşketinên berfireh ên navxweyî û herêmî guhertinên bingehîn derbas kiriye.

Tevgera "Jin, Jiyan, Azadî" di salên dawî de ne tenê li civaka Kurd, belku di heman demê de li tevahiya civaka Îranê jî bandorek mezin kiriye. Wekî din, şerê 12 rojî yê di navbera Îran û Îsraîlê de jî beşdarî guhertina hevsengiya hêzê li herêmê bûye. Di şert û mercên weha de, konferansa dawî dikare bibe xalek werçerxê ji bo xurtkirina hevgirtina neteweyî ya Kurdan û ji nû ve fikirîna stratejiyên wan ên siyasî.

Geşedanên dawî yên li Rojhilata Navîn, nemaze di çarçoveya nakokiya Îran-Îsraîlê de, ji bo çalakvaniya siyasî ya Kurd bingehên nû peyda kirine. Rejîma navendî ya Îranê ji her demê bêtir bi krîzeke rewatiya navxweyî û navneteweyî re rû bi rû ye. Ev qelsbûn ne tenê di qada siyaseta fermî de, lê di heman demê de di qadên civakî û çandî de jî xuya dike.

Ji aliyekî din ve, tevgera neteweyî ya Kurd bi sûdwergirtina ji destkeftiyên tevgerên civakî û teknolojiyên ragihandinê yên nû kariye pozîsyona xwe di raya giştî de baştir bike. Bikaranîna medyaya civakî û zekaya sûnî îhtîmala vegotina serbixwe û dijberiya propagandaya hikûmetê ji her demê bêtir gihîştî kiriye. Van amûran nifşên nû yên Kurd - nemaze Nifşê Z û Alpha - veguherandine pêşengiya têkoşînek neteweyî.

Yek ji hêzên neteweya Kurd îro hebûna civatek mîlyonî li dîasporayê ye. Ev nifûs ne tenê çavkaniyek mirovî û rewşenbîrî ye ji bo xurtkirina têkoşîna neteweyî, belku di heman demê de wekî sermayeyek mezin ji bo kişandina piştgiriya navneteweyî jî tê hesibandin.

Ezmûna dîrokî ya Cihûyan di sedsalên 19 û 20an de nîşan dide ku lobiyên bihêz dikarin çarenûsa neteweyan biguherînin. Neteweya Kurd jî xwedî kapasîteyek wekhev e, lê ew hîn bi awayekî hevgirtî nehatiye organîzekirin. Ger ev potansiyel bibe rastî, ew dikare bibe hêzek ajotinê ya nû ji bo tevgera neteweyî ya Kurd.

Tevî gelek derfetan, neteweya Kurd ji ber parçebûn û dabeşbûna neteweyî gelek caran di gihîştina armancên xwe yên stratejîk de têk çûye. Ev qelsiya dîrokî hîn jî gefên cidî li ser pêşerojê diafirîne. Dabeşbûna di navbera hêzên siyasî û civakî de, mîna "nexweşiyeke neteweyî", gelek caran bûye sedema windakirina kêliyên zêrîn.

Konferansa dawî dikare bibe xalek werçerxê di derbaskirina vê qelsiya dîrokî de. Mercê bingehîn ê serkeftinê ew e ku ber bi peymanek civakî-neteweyî û pabendbûn bi prensîbên hevkariyê li derveyî cudahîyên partîyan ve biçe. Tenê di çarçoveyek wisa de tevgera neteweyî dikare derfetên nû bigire.

Yek ji xalên sereke yên konferansa 28ê Îlonê hebûna kesayetên serbixwe û akademîk bû. Ev nîşan dide ku hêzên siyasî yên Kurdistanê hêdî hêdî girîngiya tevlêbûn û pirrengiyê di nav refên xwe de fêm kirine. Lêbelê, gavên din divê berfirehtir bin.

Ji bo bidestxistina yekîtîya rastîn, girîng e ku nûnerên hemî beşên civakê, ji rêxistinên civaka sivîl û tevgerên civakî bigire heya komên olî û çandî, beşdarî vê pêvajoyê bibin. Bi taybetî, hebûna kêmneteweyên olî yên wekî Yarsaniyan dikare rewatiya û firehiya vê yekîtîyê garantî bike. Tevgerek ku nikaribe bersiva dengên cihêreng ên civakê bide, dê mehkûm be ku dabeşbûnên kevin ji nû ve hilberîne.

Li Kurdistanê îro, nifşên nû di şekildana pêşerojê de roleke girîng dilîzin. Nifşên Z û Alpha ne tenê hostayên teknolojiyên nû ne, lê di heman demê de bi perspektîfek gerdûnî û nirxên civakî yên nû ketine meydanê. Ji bo van nifşan, nasnameya neteweyî û xwesteka serweriya siyasî ne tenê xwestekek herêmî an herêmî ye, lê beşek ji xwestekek gerdûnî ya ji bo edalet û azadiyê ye. Ev guhertina kalîteyî di helwesta nifşên ciwan de derfetek mezin e ji bo ji nû ve avakirina baweriya civakî û zêdekirina rewatiya tevgera neteweyî ya Kurd. Ger partî û rêberên siyasî karibin bi van nifşan re têkilî daynin û wan bi awayekî çalak di biryardanê de beşdar bikin, tevgera neteweyî dê bikeve qonaxek nû ya dînamîzmê.

**Pêşeroja Yekîtiya Neteweyî ya Kurd**

Konferansa heft partiyên siyasî li rojhilatê Kurdistanê dikare wekî destpêka "peymanek neteweyî ya nû" were hesibandin. Ev peyman divê li ser van prensîban were avakirin:

**1.** Têkelbûna civakî û siyasî: hebûna hemû hêz û kêmneteweyan di pêvajoya biryardanê de.

**2.** Bikaranîna potansiyela dîyasporayê: rêxistinkirina civakên Kurd li derveyî welêt wekî baskek navneteweyî.

**3.** Bikaranîna teknolojiyên nû: veguherandina torên civakî û zekaya sûnî bo amûrên stratejîk.

**4.** Bersivdayîna pêdiviyên nifşên nû: afirandina qadeke beşdar û vekirî ji bo ciwanan.

**5.** Pêşxistina stratejiyeke hevpar: derbaskirina reqabetên partiyan û balkişandina ser armancên neteweyî.

Ger ev prensîb werin bicîhanîn, konferansa dawî dikare bibe destpêka qonaxek nû ya hevgirtina neteweyî ya Kurd; qonaxek ku tê de derfetên dîrokî êdî nayên ji dest dan.

Geşedanên siyasî, civakî û teknolojîk ên di salên dawî de platformek nû ji bo tevgera neteweyî ya Kurd peyda kirine. Rejîma navendî ya Îranê di krîzeke meşrûiyetê de ye, hevsengiya hêzê li herêmê di berjewendiya Kurdan de diguhere, dîyaspora ji bo tevgerê sermayeyek bêhempa ye, û nifşên nû bûne hêzek pêşeng.

Di şert û mercên weha de, konferansa 28ê Îlona 2025an ne tenê civîneke partî ye, lê di heman demê de derfeteke dîrokî ye ji bo ji nû ve pênasekirina tevgera neteweyî ya Kurd. Ger ev civîn bikaribe bibe sedema peymanek civakî-neteweyî ya berfireh, em dikarin hêvî bikin ku neteweya Kurd dê gavên biryardar ber bi yekîtî û pêkanîna îdealên xwe yên demdirêj ve bavêje.

# Hişikbûna Gola Urmiyê: Trajediyeke siyasî-ekolojîk



N. Elî Munezemî

Gola Urmiyê ku yek ji mezintirîn golên şor ên cîhanê bû, îro ew êdî bi tevahî nemaye, Bûye çol û bahozên tozê. Bi mîlyonan mirovên li herêmê her roj tewî wê yekê berewrû ne ku çawa debara jiyan, tenduristî û jîngeha wan di xetereyê de ye. Ji bo fêmkirina vê karesata ekolojîk, divê mirov ji av û hewa û hişkesaliyê wêdetir binêre û çavên xwe ber bi biryarên siyasî ve bizivirîne. Ji perspektîfeke siyasî-ekolojîk ve, çikbûna gola Urmiyê di serî de encama polîtîkayên têkçûyî û bikaranîna hêzê ye ji aliyê rejîma dagîrker a Îranê ve.

Ekolojiya siyasî li ser çavkaniyên xwezayî - wek av - lêkolînê dike ka çawa bi rêya hêz, aborî û siyasetê têne formdan û parvekirin. Derheq gola Urmiyê, krîz ne tenê girêdayî bi kêmbûna baran û nixtê ye, lê ew bêhtir girêdayî wê yekê e ku rejîmê çawa av birêve biriye û parvekiriye.

Bi dehan salan e ku rayedarên Îranê bi armanca kêmkirina girêdayîbûna bi welatên bîhanî, siyasetek ewlehiya xwarinê dimeşînin. Ewan bi her awayekê werzêr teşwîq dikirin ku asta berhemên xwe zêde bikin, lê bêyî ku sînorên ekolojîk li ber çavan bigirin û wan re girîng be ka ew yeka çawa dikare hewsengîya jîngehê têk bibe. Her gav ku cotkaran bîrên wan yên avê kêm av dibûn, ew hatin teşwîqkirin ku bîrên kûrtir bikolin. Ewê yekê jî asta ava binê erdê kêm kir.

Di heman demê de, bi sedan bendav li ser çiqên çemên dirijîyane gola Urmiyê, hatin çêkirin. Ava ku serdemekê gola Urmiyê tijî dikir, li şûna wê hindê ber bi avdanîyê, pîşesaziyê û navendên bajarî yên wekî Tebrîzê ve hate kanalîzekirin û veguheztin. Di encam de çemên ku dibû golê tijî bikin, berî ku bigihîjin golê hişk bûn. Hevsengiya ekolojîk têk çû û gol veguheriye hewzek hişkbûyî a tijî kirîstalên xwê.

Siyasetên çandiniyê yên rejîmê encamên bi taybetî dramatîk bi xwe re anîne. Her ku asta ava binê erdê dadikeve, ava ji gola şor dikişe bin erdê û şûna wê digre. Evê yekê ava bi erdê jî pîs kiriye û li rêka wê ve, ax jî hîn şor dibe, û deverên mezin ên zeviyên çandiniyê berhemdariya xwe winda kirine. Tiştê ku wekî stratejiyek ji bo ewlehiya xwarinê dihat hesibandin, li şûna wê bûye sedema çolbûn û hilweşîna çandiniyê. Yanî ewa rejîmê pilankiribû ku li aliyê xwarinê ve Îranê bigihîne asta xweserîyê, niha zaf herêm gîhandine asta "herrîserîyê" û jîngeh bi yekcarî têkdaye.

Fabrîqe û pîşesaziyên ku av zêde bikartînin, li herêmê zext zêde kirine. Gelek ji van bêyî ku li hawîrdorê binêrin hatine çêkirin, û hem çavkaniyên avê yên herêmî qirêj kirine û hem jî zêde hevcedarîya wan bi avê heye û mesrefa wan pirr zêdeye.

Yek ji tedbîrên herî nakok, guheztina avê ji çiqên dirijiyan Gola Urmiyê bo herêmên din e. Li gorî raporan, salane bi mîlyonan metreyên sê cî av ji bendavên li Bukan û Miyandoabê bo Tebrîz û deverên din ên Azerbaycanê tê veguheztin. Bi vî rengî, çemên avê yên Kurdistanê ji bo dabînkirina hewcedariyên bajarên mezin li derveyî axa Kurdistanê têne valakirin, di heman demê de gol bi xwe bê av hêlan. Herwisa, rayedarên rejîma dagîrker hindek projeye ji bo "rizgarkirina" golê dane destpêkirin, di nav de bi guheztina avê ji deverên din. Lêbelê, gelek pispor bawer dikin ku ev tedbîr sembolîk bûn û li ser plankirina zanistî nehatibûn danîn. Ewan projeyan bêyî ku encamên rastîn çêbikin, bi hederdana pereyek zêde hatine bidawîhatin.

Niha ew neheqîya rejîma dagîrker a Îranê cinayetek mezin e derheq xelkê herêmên derdora gola Urmiyê bi giştî û xelkê kurd bi xasmayî. Zuwabûna wê golê hem ekosîstem û jîngeha deverê xistîye bin tehlûkeyên mezin de û hem dibe sedema bahozên tozê yên tijî perçeyên xwê û kîmyewî. Ev bahoz dibin sedema zêdebûna bûyerên nexweşiyên nefesê, alerjî û heta penceşêrê. Doktorên li herêmê radigihînin ku zêdebûnek mezin a nexweşîyên girêdayî bi sedemên hişikbûna gola Urmiyê heye.



Ekosîstem jî di wê herêm de hilweşiyaye. Urmiye berê rawestgehek girîng ji bo çûkên koçber bû û malek biyolojîk a dewlemend bû. Îro, gelek cure winda bûne û heyvanên kuvî ku li ser giravên nav golê de dijîyan, nemane. Çandiniya li dora golê pir dijwartir bûye, û bi hezaran malbat debara xwe winda kirine. Koçberî ji herêmê zêde dibe, ku encamên civakî girantir dike.

Ji perspektîfek felsefî ya jîngehê ve, rewşa gola Urmiye ne tenê pirsgirêkek jîngehê ye, lê ew pirseke girêdayî edaletê ye. Teoriyên edaleta jîngehê destnîşan dikin ku krîzên jîngehêdi bin bandora rewşeke nehewseng de serî hildidin. Di vê rewşê de, ewa nifûsa Kurdistanê û parêzhega Urmiyê ne ku bêhtir li her aliyek din bedelê didin, di heman demê de hikûmeta navendî û elîtên bajarî yên ne-kurd ji çavkaniyên avê sûd werdigirin.

Ji perspektîfek felsefî ya jîngehê ve, Urmiye ne tenê li ser jîngehê ye, lê li ser edaletê ye. Teoriyên edaleta jîngehê destnîşan dikin ku krîzên jîngehê bi rengekî nehevseng bandor dikin. Di vê rewşê de, ew nifûsa Kurdistan û Azerbaycana Rojava ne ku bedelê didin, di heman demê de hikûmeta navendî û elîtên bajarî ji çavkaniyên avê sûd werdigirin.

Eko-fîlozofê Norwêcî Arne Næss tekez dike ku xweza xwedî nirxek hundurîn e, xêncî ku sûda wê mirovan çi be. Wêrankirina golek mîna Urmiyê ne tenê xeletiyek aborî ye, lê di heman demê de ji hêla exlaqî ve jî pirsgirêk e. Fîlozof Hans Jonas jî vê yekê wekî nebûna berpirsiyariyê li hember nifşên pêşerojê bi nav bike. Û ekolojiya siyasî jî tîne bîra me ku krîzên weha ne tesadufî ne, lê encama hilbijartinên siyasî yên berbiçav in.

Rizgarkirina Gola Urmiyê tişteke zêdetir li projeyên teknîkî jêre hevce dike. Siyaseteke berfireh a avê ku sinûrê tehemula xwezayê destnîşan bike û çandinî dibe li gor çarçoweyên domdar werin birojkirin, û bikaranîna bêberpirsiyarane a avê di pîşesazî de divê were rêkûpêk kirin û veguheztina avê bo herêmên din were sekinandin. Dibe xelkê Urmiyê bi xwe biryar bide ka çawa dikare çiqên ava dirijin gola Urmiyê pîlan bike da ku bikare wê golê rizgar bike.

Zuhabûna Gola Urmiyê trajediyeke siyasî-ekolojîk e ku ji ber siyaseta xelet û îstismara desthilatdariyê çêbûye, û encamên wê hem xelkê û hem jî xwezayê tehdît dikin.

Pêdivîye herwisa sîyaseta şaş a rejîmê derheq zuwakirina gola Urmiyê, wek sîyaseta komkujîya xelkê wê herêmê li cem sazîyên berevankar yên mafên mirovan were nasandin û rejîm hember wan sîyasetên dijminkarane û dijî mirovî were mehkûm û berpirsyarkirin. Ew cinayeta dibe wek belgeyek li dosîyeya tijî zilm û cinayeta wê rêjîmê de were qeydkirin. Liber ku av bingeha jîyanê e û parastina wê erk û berpirsyaretiyek sîyasî û exlaqî e.

# Heta Edebxanê tixûbê we ye



N. Serbest Urmiye

**Rûreşiya dîplomatîk, berhema sîstema tepeserkar**
Di cîhana siyasetê de, şermezarkirina Serok Komarekê di asteke bilind a cîhanî de bûyereke asayî nahê hesab kirin.

Dema ku parêzerên ewlehiyê û di civata cîhanî ya Serok Komarên cîhanê li "New York", ji Serok Komarê Îranê û şanda wî re dibêjin: "tixûbê hatin û çûna we tenê heya edebxanê ye," ev ne şaşfêmkirineke asayî ye, belku nîşaneya bê hitbarbûna navneteweyî ya sîstemekê ye ku bi destên xwe hitbar û rûmeta xwe ya exlaqî, dîplomatîk û mirovî di heyamê desthilatdariya xwe de torandiye.

Rejîma Îslamî ya Îranê, ku hebûna xwe bi dirûşma "Serxwebûn, Azadî û wekheviyê" destpêkir, îro gihîştiye xalekê ku di asteke herî bilin a cîhanî de, Serok Komar û hevrêyên wî ne wekî nûnerên welatekê, belku wekî mêvanên nexwestî û bargiranî tên mêze kirin.

**Ji xewle ketinê ve bo bêhitbarbûn di cîhanê de**
Dirûşma "Ne Rojhilat û ne jî Rojava" her di destpêkê de, Komara Îslamî xiste çepera hevrikiyê bi cîhanê re.

Lê rejîmê li şûna avakirina pergal û moraleke serbixwe û gelhez, welatek ava kir ku hem ji hêla Rojava ve hate dûrxistin, û hem jî li Rojhilatê hate bêrûmetkirin.

Bo nimûne, di wan salên dawiyê de, heta welatên mîna Çîn û Rûsyayê - ku Tehran ji wan weke "hevçeperên xwe yên stratejîk" nav tîne - di civatên navneteweyî de xwe ji dengdanê bi qazancê Îranê diparêzin.

Çînê di Konseya Ewlekariyê de gelek caran helwesteke qeçine li dijî Îranê girtiye û Rûsyayê jî çi dema ku ji cezayên li dijî Îranê sûd wergirtibe, qet gavek nehavêtiye da ku mafên mirovan di Îranê de biparêze.

**Ev bêhitbarî encama karnameya sîstemekê ne ku tu welatek nikare paşguh bixe:**
Ji piştevaniya eşkere ya komên çekdar û şerxwaz di Rojhilata Navîn de bigire heya tepeserkirina hovane ya xwepêşandanên nerazî ji siyasetên rejîmê. Di dîplomasiya cîhanî de, welatek ku bi guleyan bersiva welatiyên xwe bide, nikare hêvî bike ku di koşkên navneteweyî de bi rûmet ve were hembêz kirin.

**Siyaseta tepeserkirinê di hindur de, dengvedana cîhanî li pey tê**
Rezîlkirina Serok Komarê Îranê di Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî de encama siyaset û kiriyarên rejîmê ne bi gel re.

Dema ku wêneyên kuştina Jîna Emînî û bi sedan xwepêşanderên din li herçaraliyên cîhanê hatin weşandin, wêneyek ji rejîma Îranê di raya giştî de xemilandin ku êdî bi dîrok û çanda gelên Îranê re hev ne digirtin.

Medyaya navneteweyî li dor jinên wêrek ên ku serpoşên xwe havêtin nivîsandin û ji hikûmetek mêran axaftin ku Jinan bi sûçê azadîxwaziyê tepeser dikin.

Di rewşeke wilo de, çi serokeke cîhanê ne amade ye ku bi rûmetekî geş li kêleka nûnerê hikûmetekê bisekine ku hêj ji bo parastina desthilatê ji qemçû, girtin û darvekirinê mifahê werdigire.

**Rûreşiya dubare bo dîplomatên rejîma Îranê**
Eva ne cara yekem e ku nûnerên Komara Îslamî ya Îranê di asta navneteweyî de bêne şermezarkirin.

Sala 2019`an, Wezîrê Derve yê wê demê Mihemed Cewad Zerîf dema ku bo beşdarbûnê dikonferansek ewlehiyê gihîşte bajarê Mûnîxê, bi fermî nehate pêşwazîkirin û bê vê hindê ku çi civîneke fermî bi nûnerên welatên din re hebin, wegeriya Îranê.

Di heman salê de, dema ku Mihemed Cewad Larîcanî di Konseya Mafên Mirovan a NY`ê de berevanî ji yasaya darvekirin û tepeserkirina xwepêşandanan kir, nûnerên Ewropayê ji hola civînê derketin û jê guhdarî nekirin .

Di sala 2022an de jî, Îbrahîm Reîsî, Serok Komarê wê demê yê rejîmê, dema beşdarbûnê di Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li "New York" ê, bêy ku çi hevdîtinek bi berpirsên payebilind ên Rojavayî re hebin wegeriya û di heman demê de jî di medyaya Amerîka de ew weke dijberê hov yê mafên mirovan hate bi nav kirin.




Di rastî de, şermezarkirina vê dawiyê li "Washington" ê jî bi hêceta wan rûreşiyan e ku rejîmê bi siyasetên xwe yên hovane li dijî gelê Îran û cîhanê di karnameya xwe de tomar kir.

**Ji tirîbûnên berevanîkar ve ber bi bêdengiya neçarî**
Heyamekê Komara Îslamî di tirîbûnên cîhanî de bi navê parastina bindest û hejaran, bangewaz didan û diqîrand, lê îro di komcivînên navneteweyî de mafê axaftinê jî jê hatiye sitandin.

Di rastî de dema ku di pêgeheke cîhanî de tenê destûra çona destavê ji Serok Komarê Îranê re tê dayîn, wate ew rastiye tê ragihandin ku te mafê biryardanê di asta cîhanî de nîne. Ev hevok ji rewşa heyî ya rejîmê re metaforeke tal e, wate sînûrdarbûn, bêhitbarî û şermizarî.

**Encam**
Şermezarkirina Serok Komarê Îranê di civîna cîhanî de, ne komploya dijminên bîhanî ye, belku encama siyasetên Komara Îslamî bi xwe ye.

Hikûmetek ku li şûna gotûbêj û li hev têgihîştinê, sansûr û tundûtûjiyê hildibijêre, û li dewsa bawermendiyê gefan bike, bê guman dê rastî zext û givaşan were.

Pirsgirêk ne di navbera gelên Îranê û cîhanê de ye, belku di navbera cîhan û pergalekê de ye ku tepeserkarê gelan e .

Heta ku arîşeyên di navbera wê rejîmê û gelên Îranê de nehên çareserkirin, çi yek ji Serok Komarên rejîmê di cîhanê de ji bilî şermezarî û sînûrdarkirinê tiştek din qazanc nake.

# Gola Urmiyê: Qurbaniya bi zanebûn a siyasetên wêranker ên Komara Îslamî



N: Hesen Mukerem



Gola Urmiyê, yek ji mezintirîn çavkaniyên avê li Rojhilata Navîn û çavkaniya jiyanê ya bakurê Rojhilatê Kurdistanê bû, lê mixabin îro bûye çolistaneke şor a kujer.

Ev karesat ne "bûyerek xwezayî" ye, lê berhema bêkifayetî û kiryarên bi zanebûn ên rayedarên Komara Îslamî û Spaha Pasdaran a terosrîstperwer a rejîma Îranê ye.

Biryarên ku bi armanca wêrankirina jîngehê û bêparhiştina jiyana bi mîlyonan kesan li bakûrê Rojhilatê Kurdistanê hatine girtin, niha rûyê xwe yê karesatbar eşkere kirine.

Mirinek bêdeng lê plankirî, hişkbûna Gola Urmiyê encama salan ji derxistina zêde ya çavkaniyên avê, çêkirina bendavan, guherandina rêreva av û çem û projeyên "pêşkeftinê" yên ku di bin çavdêriya Spaha Pasdaran a terorîst a rejîma Îranê û saziyên hikûmetê de hatine kirin bû.

Derewên belavbûyî yên li ser "vejandina golê" tenê perdeyek bûn ji bo veşartina niyeta rastîn a vê rêjîmê.

Çolake şor û bêmirov di dilê herêmekê de diafirîne ku her tim ji bo Kurdan û komên din ên etnîkî bingehek berxwedana siyasî û civakî bûye.

Bahozeke Xwêyê; Bombeyeke Kîmyaî ya Xwezayî Îro, gundên li dora golê piranî têne valakirin. Bahozên şor ne tenê pişik û çermê mirovan dişewitînin, belku di heman demê de axa çandiniyê û jiyana her zindiyekê jî wêran dikin.

Ev bahoz di rastiyê de "çeka bêdeng" a rejîmê ye ku dê hêdî hêdî lê bi bandor jiyanê li beşên mezin ên bajarên Rojhilatê Kurdistanê, û heta deşta navendî ya Îranê ne gengaz bike.

Spaha Pasdaran a terorîst û wêranker a Rejîmê : dema ku em bi dû sebebkarê Mirina Golê digerin, di hemî projeyên ku çavkaniyên avê yên Urmiyê wêran dikin de, navê Spaha Pasdaran ya terorîst xuya dike, saziyek ku bi avakirina bendavên bêplan, planên veguhastina avê yên wêranker û monopola li ser peymanên mezin îradeyek hişmend nîşan daye ku golê biçikîne û hişk bike.

Armanc ne "pêşxistina çandiniyê" ye, lê tam berevajî vê ye: Wêrankirina çandiniyê û wêrankirina ekosîstema deverên ku xelkê wan dengê xwe yê nerazîbûn û azadiyê ji yên din bilindtir diqîr in.

Koçberiya bi zorê; endezyariya demografîk di bin navê hişkesaliyê de Pêla zêdebûna koçberiya gundan û valakirina bi zorê ya bajarên derdorê nîşan dide ku karesata Urmiyê ne tenê jîngehparêzî ye, lê di heman demê de bi zanebûn weke amûrek ji bo guhertina pêkhateya demografîk û qelskirina bingehên civakî yên Kurd û welatiyên herêmê hatiye çêkirin.

Bi wêrankirina çandinî û xwedîkirina heywanan re, bi mîlyonan mirov dê neçar bimînin ku koçî derdora bajaran bikin din ên dûr bikin.

Tam ew e ku siyasetmedarên rejîmê dixwazin: nenavendîkirina deverên marjînal û komkirina xizanî û tepeserkirinê li metropolan. Gola ku hat kuştin, Gola Urmiyê ye, "nehişk bû; wan ew hişik kir." Ev cudahiya sereke ye. Komara Îslamî û baskê wê yê leşkerî, weke Spaha Pasdaran, bi çavên vekirî û niyetek taybetî, pêşeroja biyolojîkî ya herêmek berfireh ji bo berjewendiyên siyasî û armancên xwe yên qirêj feda kirin.

Tiştê ku îro weke"krîza jîngehê" tê pêşkêş kirin, di rastiyê de sûçek rêxistinkirî li dijî mirov û xwezayê ye.

Hişyarî û daxuyaniyên rayedaran li ser "gefa tenduristiya giştî" an "pêdiviya çalakiya lezgîn" ji pêşandanek derewîn wêdetir ne tiştek e. Rastî ev e ku Komara Îslamî bi xwe sedema sereke ya vê karesatê ye.

Kurdên Rojhilatê Kurdistanê û welatiyên herêmê niha şahidê wê yekê ne ku hikûmetê bi zanebûn ne tenê jiyana mirovan, lê di heman demê de av, ax, hewa û pêşeroja nifşan jî wêran kiriye.

Gola Urmiyê îro sembola heman siyaseta demdirêj a Komara Îslamî ye: bikaranîna jîngehê weke amûrek ji bo tepeserkirinê. Ev gol hate qurbanîkirin da ku xelk neçar bimînin bêdeng bimînin û koçber bibin.

Lê wêrankirina golê ne tenê xelk bêdeng nekir, belkî di heman demê de hêrs û hişyarî jî anî. Hikûmetek ku bi zanebûn golek kuşt, dê zû yan dereng li ber dadgeha dîrok û gel bersiv bide.

Di vê pêywendiyê de Dr. Mehdî Zar`i, profesorê jeolojiyê, nivîdsiye ku: "Wêneyên Gola Urmiyê ku di nîvê Xermanana 1404`ana Rojî de bi tevahî zuwa dibe, cihê heyrîmanê ye, û pirsek derdikeve holê ku divê em di encama vê bûyerê de çi hêvî bikin? Bandora herî berbiçav wêrankirina biyolojîk a bêhempa ya golê ye.



## Nerîna



**"Mesrûr Barzanî":**

**"Gelek pispor li Kurdistanê bi xwe hene û ciwanên me hem karîne nûjeniyê bikin û hem jî beşdarî pêşketinên teknolojîk ên ku niha li çaraliyê cîhanê diqewimin bibin."**



**"Mezlûm Ebdî":**

**"Serokê Amerîkayê "roleke dilsoz û çalak ji bo gelê Sûriyeyê di hewldana çareserkirina krîzê û bidestxistina pêşerojeke baştir ji bo Sûriyeyê û hemû Sûriyan de lîstiye."**



**"Binyamîn Netanyaho ":**

**" Em vê digehne dawiya şerê Xezê, lê karê me hîna bi dawî nebûye, Mûşekên Îranê dikarin bigehne Amerîka jî"**



**"Donald Trump" :**

**Eger Hemas di mayîna li ser desthilatê de israr bike, dê "bi temamî tune bibe".**

# Rêjîma dagirkar bi darê zorê dengê Pexşan Ezîzî tomar kiriye



**N. Eskender Ceiferî**



Piştî ku dengê Pexşan Ezîzî girtiya siyasî ya Kurd ji nav girtîgehê derket ku tê de daxwaza alîkariya Xezê dike, niha derdikeve holê ku gotinên wê di bin givaşê de bûne.

Çalakvan dibêjin Pexşan di destpêka gotinên xwe de gotiye mixabin ez bi darvekirinê hatime sizakirin. Ev jî xuya dike ku ew bi zorê hatiye neçarkirin ku biaxive.

Pexşan Ezîzî, heman keça Kurd e ku kariye histûnên Tehranê bihejîne. Birayê Pexşan Ezîzî beriya niha gotibû "Ew bi sê sûcên nakok bi darvekirinê hatiye sizakirin."

Dîwana Bilind a dagirkariya Îranê daxwaza ji nû ve darezandina girtiya siyasî ya Kurd a bi navê Paxşan Ezîzî red kiribû. Ew xebatkara civakî herî dawî bi sûcdariya "rêveberiya serhildana çekdarî ya li dijî dagirkar" sizayê darvekirinê lê hat birîn.

Niha rêjîma dagirkar a Îranê, Pexşan Ezîzî neçar kiriye ku rexneyê li Amerîka û Îsraîlê bigire. Gotinên wê yên berê û wêrekiya wê, derxerên vê rastiyê ne.

Li gor ku Aso Ezîzî birayê Pexşanê dibêje, Dîwana Bilind bêyî ku dosyeyên li ber destên dadgehê lêkolîn bike, daxwaza duyemîn a darezandinê red kiriye.

Parêzerê wê jî dibêje parastin bi tevahî wekî "bêbingeh" hate redkirin - her çend redkirina bêbingehîn bêyî lêkolînkirina belgeyan yasayî nîn e.

Pêvajoya serîlêdanê tenê sê rojan li ber xwe da, du ji wan rojên bêhnvedanê yên fermî bûn. Ev jî nîşanek din e ku sedem û belgeyên ku ji aliyê malbatê ve hatine şandin bi têra xwe neketine ber lêkolînê.

Lê dagirkar di girtîgehê de dev ji Pexşanê bernade û ew neçar kiriye ku li dijî Îsraîlê biaxive.

Li gorî Aso Ezîzî, di dozê de nakokiyên eşkere hene: xwişka wî zêdetirî deh salan wekî xebatkara civakî ya xwebexş li kampên penaberan li Başûrê Kurdistanê û Rojavayê Kurdistanê kar û xebat kiriye, û bi rêxistinên navnetewî yên wekî Xaça Sor û rêxistinên alîkariyê yên Swîsê re hevkarî kiriye. Di pêvajoyê de belgeyên têkildar hatin pêşkêşkirin.

Lê belê, di çarçoveya lêpirsînê de, Paxşan Ezîzî li pey hev bi endambûna di sê grûpên bi temamî cuda de hat tometbarkirin: Pêşî Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK), piştre têrorîstên "Dewleta Îslamî" (DAIŞ) û di dawiyê de endametiya Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê (PDKÎ).

Li gorî malbata Ezîzî, ev îdiayên lihevnehev vê pirsê derdixîne holê ku gelo bi awayekî cidî lêkolînek li ser rastiyan hatiye kirin yan na?!

Di 4ê Tebaxa 2023an de, Pexşan Ezîzî ji aliyê hêzên ewlehiyê yên Tehranê ve hat girtin û piştî çend mehan lêpêçînê, ji bo beşa 209 a girtîgeha Êvînê hat veguhestin.

Di heman demê de, dadgehê bavê wê bi navê Ezîz Ezîzî, xuşka Pexşanê bi navê Pirşeng Ezîzî û xezûrê wê bi navê Husên Ebasî bi îdiaya "alîkariya Pexşanê ji bo revê" bi salek girtîgehê siza kir. Dadgeha Pêdeçûnê jî ew biryar erê kir.

Di dema binçavkirina wê de, ne Paxşan Ezîzî û ne jî endamên malbata wê yên girtî ne bi parêzer û ne jî bi cîhana derve re têkilî nedanîbûn.

Piştgiriya yasayî wê demê karî were organîzekirin, ku lêpêçîn bi dawî hat. Aso Ezîzî dilgiraniya xwe tîne ziman ku rêjîm bi qestî dixwaze bi darezandina girtiyên siyasî peyamekê bide.

Di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Bi salvegera şoreşa 'Jin, Jiyan, Azadî' re em roj bi roj sizayên tund dibînin. Xuya ye ku Îran dixwaze bi tundî bersivê bide her cure nerazîbûnekê. Bi taybetî ji bo tirsandina tevgera jinan." Malbata Ezîzî ditirse ku sizayê darvekirinê yê Paxşan di demek nêzîk de were cîbicîkirin.

Pexşan Ezîzî di nameyek vekirî ya ji girtîgeha Êvînê ya di 21ê Tîrmeha 2024an de bi sernavê "Redkirina Rastiyê û Altêrnatîva Wê" basa şert û mercên girtîgehê kir.

Wê êşkenceya sîstêmatîk a di odeyên takekesî de vegotibû û ragihandibû, ku çend caran ew biribûn ber mirin û daliqandinê, li destên wê û hestiyên wê dabûn heya dema ku hişê xwe winda bike, bêrêzîkirin û îşkenceya derûnî jî, beşeke din ji îşkenceyan e.

Êşkencekarên wê jê re digotin "cudaxwaz", "wekî kurdek, welatiya pileya duyemîn" û "wek jinek şêtek civakî". Di nameya wê de wiha hatibû gotin: "Ji bo desthilatdariya navendî, em piçûk û ne girîng in - lê ji bo darezandinê, em herî mezin û giran in."

Pexşan Ezîzî yekem car di 16ê Mijdara 2009ê de, di xwepêşandaneke xwendekarên Kurd de li Tehranê hat girtin.

Wê demê xwepêşandan li dijî sizayên darvekirinê yên girtiyên siyasî yên Kurdistanê dihatin kirin. Piştî ku ew 4 mehan di girtîgehê de ma, bi barimteyê hat berdan û piştre jî welat terikand.

# Nezelaliya Helwêsta Amerîka li hember mafên Gelê Kurd li Sûriyê



N. Ebdulezîz Qasim



Piştî derbasbûna nêzîkî yazdeh mehan li ser rûxandina rêjîma Be'is li Sûriyê û hatina HTŞ li ser desthilata Sûriyê, wisa diyar dibe ku wê hîç niyazek erênî li hember çareserkirina pirsgirêka Kurdî nîne, û herwiha ku bi heman zihniyeta rêjîma berê dixebite û siyaseta li dijî gelê Kurd xudan dike û heman siyaseta nijadperistî li dijî gelê Kurd didomîne.

Nemaze piştî piştgiriya dewletên Erebî, Amerîkî, Ewropî û Rûsyayê ji bo wê û pêşwaziya germ li Ehmed El-Şera'h (El-Culanî) li Neteweyên Yekbûyî, ku dîtir sadetirîn maf bo netewa Kurd qebûl nake û bi taybetî ku Tirkiyê bi zelalî piştgiriya siyaseta (El- Culanî) li dijî gelê Kurd dike, û radiwestê li hember her destkefteke neteweyî bo Gelê Kurd û bûye kelem û astengiyek mezin li pêşiya daxwazên neteweyî yên gelê Kurd, ku her statoyek kurdî red dike û wekî gefek rasterast li ser ewlehiya xwe ya neteweyî dibîne.

Lewra wisa diyar dibe ku zehmetî û astengiyên mezin dê bikevin li pêş çareserkirina pirsa neteweyî ya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê, ku bêyî piştgiriyek navdewletî bihêz, dibe ku Kurd nikarbin mafên xwe misoger bikin û destkeftên hatine bidestxistin biparêzin.

Îro li hember hewldanên Tirkiyê û gefên desthilata demkî ya Sûriyê, pêdiviya Gelê Kurd bi piştgiriya tevaya Gelê Kurd li Kurdistanê heye û bi taybetî piştgiriya Herêma Kurdistanê, zêdebarî ku pêdiviya Rojavayê Kurdistanê bi piştgiriyek navdewletî ya bihêz heye û bi taybetî pêdivî bi piştgiriya Amerîka û Ewropî heye, ku îro Fransa bi rolek mezin radibe bo piştevaniya çareserkirina pirsa neteweyî ya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê, herwiha ku bi zelalî piştgiriya federalizmê dike û hewl dide mêhvandariya danustandinên di navbera Rêveberiya Xweser û desthilata Sûriyê li Qesra Elîzeyê li Parîsê bikey, tevlî dijberiya Tirkiyê ya berdewam ji vê mêhvandariyê re, ku hevdem Fransa her ji destpêka damezrandina dewleta Sûriyê berî sed salî û heta niha piştgiriya mafên Gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê û hebûna statoyek Kurdî dike.

Lê wek tê zanîn ku Fransa tevî giringiya piştgiriya wê ji rûyê diplomatîk û siyasî ve, ku yek ji endamê Encûmena Ewlehiya NY'î ye û mafê Vito heye, lê li ser erdê bêyî piştgiriya dewletên dîtir yên Ewropayê kartêkirinek mezin wekî Rûsya û Amerîka nîne.

Hevdem ku Washington jî, ji aliyê xwe ve, Hêzên Sûriya Demokrat (HSD) wekî hevalbendê xwe yê serekî li Sûriya dibînê û bi taybetî di şerê li dijî DAIŞê û li dijî terorîzmê de, û ev hevpeymanî li ser zarê rayedarên herî bilind yên koça Spî û di nav de Serok Duland Trump û herwiha Serokê berê John Baden jî gelek caran hatiye dupatkirin, ku bi piranî piştgiriya xwe ya ji bo "Hevkariya Ewlehiyê" bi HSD re piştrast kiriye, lê di heman demê de garantiyên zelal derbarê pirsa neteweyî û mafên siyasî yên Gelê kurd pêşkêş nekiriye, tevî ku di salên borî de gelek hewl dida ji bo serxistina diyaloga Kurdî- Kurdî di navbera hêzên siyasî yên Rojavayê Kurdistanê de.

Lê belê, di rewşa îro de nezelaliyek di helwestê Washingtonê de li ser çareserkirina pirsgirêka Kurd li Sûriyeyê berçav dibe û bi taybetî piştî daxuyaniyên vê dawiyê yên berovajî helwesta Amerîka li ser zarê balyozê wê li Tirkiyê Thomas Barrak, ku di nav şeqama Kurdî de metirseyek peyda kiriye, nemaze ku Amerîka li ser dagîrkirina Efrîn û Serêkaniyê hîç helwestek li dijî Tirkiyê negirt!.

Washington, heta radeyekî li hember zêdexwaziya Tirkiyê radiwestê, lê hevdem Tirkiyê wek dewleteke hevpeyman ya stratejîk xwe li Rojhilata Navîn dibîne, herwiha ku endamekî NATO'ê ye, lewra Washington gelek caran guvaştina têxe li ser HSD ku asta daxwazên neteweyî kêm bike.





Lewra Washington wekî piştgirekî rasteqîn bo Gelê Kurd nayê dîtin, tevî giringiya rola wê di qada Sûriyê de, lê bawerî bi Fransa pitir dibe tevlî ku rola wê li ser erdê kêmtir ji ya Amerîka ye.

Her di vê mijarê de û di çarçova dewletên kartêker û xudan bandor û pêgeh li ser erdê û bi taybetî di qada Sûriyê de, bi hîç awayî nabe rola dewleta Israelê, wekî dewleteke zilhêz jibîr bikin, ku Israel netenê dewleteke zilhêz e, lê herwiha heta dikarê kartêkirin û destkariyê li ser siyaseta Amerîkî jî bike, lewra îro pêdivî bi dîtina deweta Israel heye, nemaze ku Israel bi awayekî aşkere piştgiriya Durzîyan dike, ku niha Durzî daxwaza serxwebûna xwe dikin, Ku îro û piştî 7'ê Oktoberê, Israel giringiya xwe heye, nemaze ku raydarên pilebilind yên dewleta Israelê di daxuyaniyên xwe behsa mafên neteweyî yên gelê Kurd û Elewiyan jî dikin.

Li dawiyê bi dîtina min, ku ev desthilata Sûriyê dê nikaribe berdewam bimîne li ser desthilatê tevî piştgiriya Tirkiyê û Qeterê jêre, û bêyî çareserkirina pirsa neteweyî ya Kurdî û bêyî misogerkirina mafên Durzî û Elewiyan dê Sûriya ber bi parçebûnê biçe.

# Herî dawî di destûrê de



N. Vênûs Fayîq
W. Hesen Mukerem



Ji dema damezrandina sîstema "dawî" ya beşdariya siyasî ya jinan li Iraq û Kurdistanê ve, ew kesên ku li ser vê mijarê diaxivin, bi berdewamî di çend eniyan de dabeş bûne.

Tiştên ku ew dibêje ji bo zîhniyeta civaka me baş in, tiştên ku ew dibêje ji bo vê qonaxê baş in, tiştên ku ew ji bo nemana wê bang dike, û hwd.

Bi rastî, pergalek wisa hem baş e û hem jî xirab e. Belê, di civaka me de, jin her tim ji ber sedemên civakî, kevneşopî û olî ji qadên siyasî û îdarî yên dewlet, rêveberî, qanûndanîn û biryardanê hatine dûrxistin.

Lê heta dawî na, belkû bo qonaxekê dibe feyde li vê sîstemê bê vergirtin, û ji wî milî ve jî xirabe ku weke qonaexeke esmanî bera xwe bidinê û qorixkirî nebe.

Lêbelê, gelek kes hîn jî vê yekê weke "dawî" bi nav dikin zagon, ku ev pirsgirêkek mezin e, ji ber ku guhertina zagonê tê wateya çareseriyek demkî ji guhertina "sîstemê" dijwartir.

Ev deme dawî ku di sala 1995an a Zaynîde di Kongreya Çaremîn a Jinan a Cîhanê de li Pîkînê hate pêşniyar kirin, ew bi zelalî weke "sîstem" hate binavkirin û weke çareseriyek demkî hate pênasekirin da ku beşdariya jinan di jiyana siyasî û îdarî de hêsan bike.

Di navbera Destûra Bingehîn a Iraqê û zagona Destûra Bingehîn a Kurdistanê de:
Benda 14 a Destûra Bingehîn a Iraqê, Beşa Yekem, Mafên Sivîl û Siyasî, dibêje: Hemû Iraqî li ber zagonê wekhev in, bêyî cudahî li ser bingeha nijad, netewe, reng, ol, meseb, bawerî, raman, an rewşa aborî û civakî.

Madeya 16 bi zelalî derfetên wekhev ji bo hemû Iraqiyan nas dike û erkê misogerkirina vê derfetê dixe ser milê dewletê.

Ji van her du madeyan ya herî girîng maddeya 20 e, ku dibêje hemû welatî, çi jin, çi mêr, mafê beşdarbûna di karûbarên giştî de û mafên siyasî, dengdan û nûnerayetî ji bo hilbijartinê hene. Ev herşê xal di piroje yasaya Destûra Bingehîn a Kurdistanê de bi zelalî nehatine behs kirin.

Xala 20 mîn a Destûra Bingehîn a Kurdistanê dibêje: "Jin û mêr li ber zagonê wekhev in.

Hikûmeta Herêma Kurdistanê dê hemû astengiyên li pêşiya wekheviyê di mafên sivîl, siyasî, civakî, çandî û aborî de rake.


Ev nivîs civaka Kurd bi dehan gavan li paş beşên din ên Iraqê hiştiye, ji ber ku destûra bingehîn a Iraqê mafên wê bi zelalî destnîşan dike."

Destûra Bingehîn a Kurdistanê ji hikûmetê dixwaze ku ji bo wê bixebite. Tiştê ku me matmayî dike ev e ku ev destûr di deriyê sêyemîn, benda 2, madeya (41) de ev sîstema dawî kiriye rastiyek, bêyî ku nîşan bide ku ew çareseriyek demkî ye, ku li ser nîvê tevahiya civakê hatiye sepandin, ku dibêje:

Sîstema hilbijartina endaman dê temsîliyeta dadperwer a civakên gelê Kurd misoger bike ku jin bi kêmanî %30ê kursiyan di parlamentoya Iraqê de hebin. Xwezaya wê madeyê ji spasdariyê wêdetir tiştek nîne.

Ew ji me re dibêje ku jin tiştek din naxwazin. Ji ber vê yekê, divê em hişmendiya parlemenê biguherînin, jin beşdarî rawestandina destûra bingehîn a bi navê Kurdistanê bibin, ne ji ber şehîdekê an jî li kêleka zilamekê di parlamentoyê de rûnin.

Di dawiyê de, nerîna min eve ku xebata bi vê sîstemê re heta roja îro ji bo komkirina hemî awayên kirêt ên cudakariya di navbera mêr û jinan de ye, ji bilî reşkirina jinan bi rêya derbaskirina wan bo parlementoyê li ser milên mêran û dûrxistin û marjînalîzekirina jinên jêhatî.



# Kurd deyndarê Îsmail Beşikçi ne!



N. Sidîq Bozerselan




Ev bû çend hefte ku li ser navê ”kurdperwerîyê”, ”welatperwerîyê”, ”sîyasetmedarîyê”, ”nivîskarîyê”, ”rewşenbîrîyê” û wd. êrîş, tehdît û heqaret li sosyologê tirk Îsmalil Beşikçi dibarînin. Li vir ez behsa êrîş, tehdît û heqaretan dikim, ne ku behsa rexneyan.

Eger di çarçoweya rexneyan da li Beşikçi rexne bihata xistin, bêguman ew di çarçoweyeka dî da dê bihata nirxandin. Beşikçi kîye û çi kirîye ku hew qas êrîş tên ser wî? Gelo çima hew qas heqaret û tehdît? Bi ya min, pêwist e bersivên van pirsan werin dayîn da ku pirs zelal bibe.

Beşikçiyê hêja, 50 sal e ku li ser kurdan gelek tişt gotine, ji 30 zêdetir kitêb nivîsîye, bi sedan mekale nivîsîye û eger mirov wan hemî kom bike; mirov bi rehetî dikare bêje ku wî bi dehhezaran rûpel jibo kurdan nivîsîye.

Ji ber van kirinên xwe ew 17 sal di zindanên tirk da maye û bi sedsalan ceza jê ra hetîye xwestin, lê ji ber sedemên navdewletî û hundûrî tirk mecbûr mane ku wî ji zindanê berdin.

Bi kurtayî Beşikçi, piştî xwendina xwe ya bilind, li Erzirumê dest bi karê asistanîyê dike û cara ewil rastî kurdan tê; ew êdî jibo mafên kurdan dixebite û heta îro wî karê xwe didomîne ku nûha ew çûye jorê 80 salî.

Bi wê zîrekî û enerjiya xwe eger Beşikçi wek gelek tirkan di nav qalikên ideolojiya dewletê da bimana û stûyê xwe xwar bikiraya; jibo wî gelek hêsa bû ku bibûya profeserek û rektorekî zaningehek. Lê wî wek alimek û sosyologek rastîya kurdan û mafên wan ên neteweyî û demokratik dît û li hemberî rejima kolonyalist derket ku ew rejim ji 1923yan virve li ser hukum bû.

Dostê Beşikçi û hevalê wî yê zindanê yê 1971an mamosta M. Emîn Bozarslan- ew jî çend sal ji Beşikçi meztir e û 60 sal e jibo kitêbxaneya kurdî dixebite ku ji nûha ve derdora 20 hezar rûpel jibo miletê xwe nivîsîye; ez jibo her du xebatkarên doza kurdî sihet û temenên dirêj dixwazim-, di 2007an da jibo Beşikçiyê hêja weha gotîye: … Li gora dîtina min a berê û nûha em kurd, ji berrêz Beşikçi ra gelek tişt deyndar in.

Ew nivîskar û alimekî tirk ê tenê ye, ku rejima ku ji 1923an virve politika nejadperestîyê li hemberî kurdan pêkanîbû, ew wek alimekî zanînê bi mêrxasî li dijî wê plotikayê rawestîya, bi metodên zanistîyê wê politikayê teşhîr kir, rûyê wê yê rastîyê û nejadperestîyê raxist ber çav.” (M. Emîn Bozarslan, İsmail Beşikçi ile Uluslararası Dayanışmanın Belgeleri, s. 8, Deng Yayınları 2010 İstanbul)

“Piraza mêran li meydanê ye”
Ev gotina pêşîyan li gora cenabê bejna Beşikçi xweş tê ku kesek jibo Beşikçi dema bixwaze tiştna bêje, divê li gora vê gotina pêşîyan ewil bifikire û paşê biaxife ango binivîse.

Bi kurtayî mamosta Beşikçi bi deh caran derketîye huzûra dadgehên tirk. Wî tu car ji mehkemeyên (dadgehên) tirk doza berdana xwe nekirîye.

Heta car caran endamên mehkemeyê aciz bûne û xwestine ku wî berdin; lê bi awayeke ne direk xwestine ku Beşikçi ji wan doza berdana xwe bike.

Beşikçi jî bi awayeke kubar ji wan ra gotîye ku ”ez alimekî me û li gora ilmê zanistê li pirsa kurdî dinêrim û ez nikarim ji we daxwaz bikim ku hûn min berdin, ji ber ku ez heq im û mehkemeya we neheq e û nemeşrû ye.”

Bi tabîreka dî, mamostayê hêja her cara ku çûye mehkemeya tirk, wî bizmarek li dîwarê Sistema Ankarê ya Kolonyalîst xistîye û wî dîwarê hesinî qul kirîye ku 50 sal e kurdên me nikaribûne vê mêrxasîyê bikin.

Mamosta Beşikçi, di zêdetirê 50 salê pratika xwe da pirtir bû muxatabê Mehkemeyên Tirk. Ji ber ku karê wî nivîsîn bû, lêkolîn û nirxandin bû, loma ew dibû muxatabê mehkemeyan û di şexsîyeta mehkemeyan da jî dibû muxatabê Sistema Ankarê ya dagirkerê Kurdistanê. Beşikçi jibo kurdan timî dewleteka serbixwe parastîye û wan dîtinên xwe hem di kitêbên xwe da û hem di mehkemeyan da parastîye.

Di vê pêvajoyê da Beşikçi, wek ilimdarekî tirk, sîyaseta kurdan jî dişopand û car caran şaşîtîyên ku ji alîyê kurdan ve dihat kirin, didan ber tîrên xwe yên rexnekirinê. Yek ji wan rexneyan ew bû ku divê kurd bi kurdî biaxifin, binivîsin, sîyasetê bikin û di mehkemeyan da jî xwe bi kurdî biparêzin. Beşikçi, vê xesasîyeta nasnameya zimanê kurdî ji 1971an virve tim parastîye.

Lê divê ez bînim bîra hemî kesên ku êrîşan dibin ser Beşikçi, divê ew carek be jî li eynikê binêrin û xwe tê da baş bibînin û pratika zêdetirê 50 salên Beşikçi bînin ber çavan û derzîyeka biçûk di xwe da bikin.

Ji ber ku em heq in û dagirkerên welatê me neheq in; em tenê dixwazin li ser erdên xwe bi awayeke azad û bêminet bijîn. Ev ji mafê hemî civatan e ku li vê cîhanê dijîn.

Loma em dê bi serkevin. Belam dîroka mirovatîyê ber bi pêş ve dimeşe û gelê kurd jî dê Kurdistana xwe ya serbixwe û azad ava bike.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Du Kolberên Kurd ji aliyê hêzên rêjîmê ve hatine kuştin

Roja 13ê Rezbera 1404 a Rojî, kolberek ê bi navê "Mehîd Şerîfî", kurê "Salih" ê xelkê gundê "Kanî Sêw"ê ser bi bajarê Banê li encama teqeya rasterast a hêzên hov ên sînorî yên rêjîma Îranê li sînorê "Sardawê" ser bi bajarê Banê, hate kuştin.

Pêka raporên belavbûyî, hêzên hov ên sînorî, bê agehdarkirina berê teqe li wî kolberî kirine û ew kuştine.

Termê "Mehdî Şerîfî" ku bavê zarokek ê bi navê "Sarwîn" e, bo nexweşxaneya bajarê Banê hatiye veguhastin û heta belavbûna vê nûçeyê, termê wî kolberî bi malbata wî nehatiye dan.

Roja 9ê Rezberê jî, hêzên rêjîmê li xala sînorî ya "Sor Kêw"ê de bi awayê rasterast û bi gulleyên şer, teqe li kolberekî temen 38 salî yê bi navê "Rêbwar Mihemedzade" yê xelkê gundê "Sipîdar"ê ser bi bajarê Banê kirine ku li encama vê teqê de navbirî canê xwe ji dest daye.

Pêka vê raporê, termê wî kolberî ku bavê 2 zarokan bû, bo nexweşxaneya "Selahedîn Eyûbî" ya bajarê Banê hatiye veguhastin.

Pêka amaran li 6 heyvên destpêkiya sala 1404 a Rojî de zêdetir ji 37 kolber li deverên sînorî û rêyên li navbera bajarên parêzgeha Urmiye, Kirmaşan û Sinê de li encama teqeya rasterast, renî û sirû seqemê, teqîna mîn, weresiyan ji bilindahiyan, hatine kuştiun an birîndarkirin ku ji vê rêjeyê "%46 kuştî" û "%54 birîndar" bûne.



## Rêjîma Îranê serhev 90 sal girtîgeh bi ser 10 Jinên bawirmendê ola Behayî de sepand

Pêka raporên belavbûyî, dadgeha rêjîmê li bajarê Îsfehanê de bi serokatiya "Fîroz Rewanmêhr û Elî Diyanî" bi tohmeta propaganda li dijî rêjîmê, çalakiyên teblîxî û hînkariyê li dijî rêkarên ola Îslamê, 90 sal girtîgeh û 900 milyon Tûmen sizaya nexdî, bi ser 10 jinên bawirmendê ola Behayî yên xelkê bajarê Îsfehanê de sepand.

Pêka wê raporê, Nida Bedexş, Perestû Hekîm, Yêgane Rûhbexş, Yêganê Agahî, Arizû Sehaniyan, Mujgan Şahrizayî û Şana Şoqîfer", 10 sal girtîgeh û 100 milyon Tumen sizaya nexdî û "Beharê Lotfî û Nida Imadî" her yek 5 sal girtîgeh û 50 milyon Tumen sizaya nexdî, bi ser wan de hatiye sepandin û derketina wan ji Îranê û bikaranîna torên civakî heta 2 salan ji aliyê rêjîmê ve bo wan hatiye qedexekirin.



## Rêjîma Îranê 6 hevwelatiyên Ereb li rojekê de bidar vekirin

Pêka raporên belavbûyî, 6 hevwelatiyên Ereb ên bi navên "Elî Mecdem, Mihemedriza Moqeddem, Moîn Xinferî, Hebîb Dirîs, Ednan Xebîşawî û Salim Mûsewî" li girtîgeha Sipîdar a rêjîmê li bajarê Ehwazê de hatine bidarvekirin.

Pêka vê raporê ev hevwelatiyên Ereb rastî îşkencekirinên hovane hatine û li jêr îşkenceyan de neçar bi tirafkirinên bi zorê bûne û dadgeha rêjîmê bi awayekî nedadpewrane bi pêka îtirafkirinên bi zorê û bê hebûna ti belgeyekê, sizaya bidarvekirinê bi ser wan de sepand ku li roja Şemî 12ê Rezberê hatine bidarvekirin.

Tenê li heyva Îlona 2025 a Zayînî de zêdetir ji 178 girtî bidar vekirine ku li ragihandinên fermî de bi tenê 171 halet hatine belavkirin.

Rêkxirava mafê mirov li Îranê rêjeya bidarvekirina zêdetir ji 171 kesî ragihandiye ku zêdetir ji 10 haletên bidarvekirinê kêmtir ji ragihandinên fermî ye.

Pêka rapora Rêkxirava Mafê mirov li Îranê, ji vê amara 171 kesî 90 kes bi tohemtên pêywendîdar bi madên hişber, 71 kes bi tuhmeta kuştinê û 2 kes bi tohmeta sîxurîkirin bo Îsraîl û kesek jî bi tohmeta Muharibe li pêywendî digel nerizayetiyên sala 1401 a Rojî de bûye ku 5 jin, 14 hevwelatiyên Belûç, 18 welatiyên Kurd, 4 hevwelatiyên Ereb û 9 kes ên xelkê Efxanistanê li heyva 9 anku heyva Îlona 2025 an a Zayînî de ji aliyê rêjîmê ve hatine bidarvekirin.



# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (503)

